



DİYARBAKIR SİYASAL VE SOSYAL
ARAŞTIRMALAR ENSTİTÜSÜ

ENSTİTUYA DİYARBEKİRÊ BO
LÊKOLÎNÊN SIYASÎ Û CIVAKÎ

DİYARBAKIR INSTITUTE FOR POLITICAL
AND SOCIAL RESEARCH

MAMOSTE GIHANDIN JI REXÊ CUDAHİYÊN ZIMANÎ Û ÇANDÎ

3

RÊZEBELAVOKÊN BERÎ HER TIŞTÎ ZIMANÊ DAYIKÊ



Kurt İsmail Paşa
2. Sokak
Güneş Plaza No:18
21100 Yenişehir
Diyarbakır
Türkiye
T: +90 412 228 14 42
F: +90 412 224 14 42
www.disa.org.tr
info@disa.org.tr



**DİYARBAKIR SİYASAL VE SOSYAL
ARAŞTIRMALAR ENSTİTÜSÜ**

**ENSTİTUYA DİYARBEKİRÊ BO
LÊKOLİNÊN SİYASÎ Û CIVAKÎ**

**DİYARBAKIR INSTITUTE FOR POLITICAL
AND SOCIAL RESEARCH**

**BERÎ HER TIŞTÎ ZIMANÊ DAYİKÊ
WEŞANÊN DÎSAYÊ**

ISBN: 978-605-5458-05-8

Belavoka Berî Her Tiştê Zimanê Dayikê perçeyêke projeya salane ya Bilindkirina Hişmendiyê derheqê Zimanê Dayikê û Duzimanî di Perwerdeyê de ye ku ji şeş hejmaran pêk tê. Di van belavokan de derheqê mijarên wek têkiliya perwerdehî û zimanê dayikê, cihê perwerdeya ser esasa zimanê dayikê di xelaskirina newekheviyan de, cihê zimanê dayikê di jiyana civakî, kulturî û siyasî de agahiyên kêrhatî pêşkêşî gel bike. Hûn dikarin belavoka dumehî li ser malpera www.disa.org.tr peyda bikin.

Nivîsarên di vê belavoka me ya sêyem de cih digirin ji çend nivîskarên cuda hatine girtin. Ji xeynî duduyan, hemû nivîsarên din taybetî bo vê belovê hatine nivîsandin. Wergerên kurmancî û tirkî bi destê Osman Mehmed hatine kirin, di tirkîkirina wan de keda Atalay Göçer, Dilan Bozgan û Şemsa Özarê gelek girîng e. Ji aliyê rupelsazî û bergsaziyê de jî em gelek spas dikin Emre Senan.

Ji kerema xwe herin rupela www.disa.org.tr/onceanadili3.pdf an jî me agahdar bikin ji bo ku belavoka me bi dest bixin.

Çap: Ege Basım Matbaa ve Reklam Sanatları

Copyright ©Sibat 2011

Belavoka Berî Her Tiştê Zimanê Dayikê wek gavekê projeya Enstituya Diyarbekirê bo Lêkolînê Siyasî û Civakî (DiSA) ya bi navê Bilindkirina Hişmendiyê derheqê Zimanê Dayikê û Duzimanî di Perwerdeyê de ku piştgiriya fona Matra'yê ya Balyozxaneyê Holandê wergirtiye di bin berpirsariya Şerif Derince de hatiye amadekirin. Dibe ku fikr û dîtinên di belavokê de cih digirin yek bi yek bi yê DiSA û Balyozxaneyê Holandê jî hev negirin. Ti astengî û rêgirtin tune li ber zêdekirin û belavkirina belavokê de tenê heke çavkanî bête destnîşankirin bi awayeke ron û zela.

Bi arîkariya



Kingdom of the Netherlands

**MAMOSTE GIHANDIN
JI REXÊ CUDAHİYÊN
ZIMANÎ Û ÇANDÎ**



Ji Aliyê Cûrbicûriya Zimanî û Kulturî ve Mamoste-Gihandin

Akademîsyen û mamosteyên ku nêzîktêdayîna pedagojiya rexneyî dipejirînin, difikirin ku li ser mijara gihandina xwendekaran wek welatîyên rexneyî, perwerdehî wê bikare erkeke giring bîne cih. Li gorî vê yekê veguherînên civakî di polan de dest pê dikin û dikarin belavî her dera ku xwendekar diçinê, malbatê, derdorê û bi van re hemû civakê bibin. Bi gotineke din, pol her çend dikarin bibin cihên ku berjewendiyên komên serdest lê tînin parastin, dikarin bibin qadên ku li rewşên civakî, li ciyawazîperestiyên û newekheviyan dikolin û hewl didin van veguherînên jî. Mijara ku wê çawa ev qad dirûv bigre, bi awayekî giring bi rolên ku mamoste hildidin ser milê xwe re têkildar e. Ev rol jî bêhtir li gorî qonaxên mamoste-gihandinê dirûv digrin.

Mamoste-gihandin qadeke wiha ye ku welat bo welat, herêma bo herêma û heta bi kultur bo kulturê cudahiye nîşan dide, û têkoşînên cûrbicûr ên desthilatê her û her bi eşkereyî lê tê hîskirin. Desthilatên ku dikarin qonaxên mamoste-gihandinê kontrol bikin, di heman demê de dikarin qadên din ên perwerdehiyê jî rehetir kontrol bikin. Lewma têkoşînên desthilatê di her merhaleya qonaxên mamoste-gihandinê de xwe bi mirov didin hesandin. Di encama van têkoşînan de ji aliyekî ve li hin deveran ew mamoste tînin gihandin ku li ser bingeha cûrbicûriya kulturî û zimanî perwerdehiyê dimeşînin, ji aliyekî din ve jî li hin deveran ew cûrbicûrî bi tevahî tê piştguhkirin û ew mamoste tînin gihandin ku pergaleke perwerdehiyê ya xwendekaran yekreng dihesibîne, pêk bînin. Celebê perwerdehiya ku berendamên mamostetiyê werdigrin, rasterast bandorê li ser têkiliyên civakî û mekanîzmeyên cûrbicûr ên desthilatê dike.

Tirkiye, digel ku welatekî pirzimanî û pirrkulturî ye, saziyên mamoste-gihandinê berendamên mamostetiyê bi awayekî wisa amade dike mîna ku wê li ser zemîneke yekzimanî û yekkulturî bixebitin. Wek serencama vê yekê jî berendamên mamostetiyê, gava ji zankoyên xwe derdixin û dest bi wezîfeya xwe dikin tûşî zor û zehmetiyên mezin dibin. Filmê *"İki Dil Bir Bavul (Du Ziman û Baholek)"* ku sala 2009an hat pêşandan, çîroka mamosteyekî vedibêje ku perwerdehiya mamoste-gihandinê ya yekreng wergirtiye û sala xwe ya pêşî li dibistaneke xwendekarên wê zimanê wan ên zikmakî Kurdî ye û bêtir ku herfeke bi Tirkî jî bizanin dest bi dibistanê kirine, dixebite ku dev ji perwerdekirina xwendekaran berde nikare bi wan re têkeve danûstandinê jî. Filmê navborî bi awayekî eşkere nîşan dide ku berpirsiyariya vê rewşê li ser milê wê pergale ye ku ew mamoste gihandiye. Digel ku li zanîngehan di beşên mamosteyan diçin de rewşeke wiha heye, li ser mijara mamoste wê çawa serî bi wan rewşan re bikin der ku piştî dest bi kar kirin, tê zanîn ku tu serçaveyên bi kêrî wan bînin tune ne.

Ji aliyekî din ve, li welatên ku cûrbicûriya kulturî û zimanî bi awayekî fermî pejirandine û bernamêyên xwe yê perwerdehiyê li gorî wê saz kirine jî yek ji mijarên ku herî zêde nîqaş li ser tê kirin mamoste-gîhandin e. Lewra gîhandina mamosteyan bi feraseteke perwerdehiyê ya ji aliyê pirrzimanî û pirrkulturî ve pirralîparêz e, pêdivî bi wê heye ku hemû pêkhênerên qonaxên perwerdehiyê bi berdewamî berçavî lê bê kirin, serçaveyên tîk bikaranîn bi awayekî rexneyî li ser bê axaftin û rêbazên tîk meşandin her tim bîkî pirsyarkirin. Tenê bi feraseteke bi vî rengî gava mamoste-gîhandin hat pêkanîn, encam wê bikare fêdeyê li pêşveçûna têkiliyên civakî yê wekhevîparêz bike.

Wek encam em dikarin bibêjin ku ji aliyê polîtîkayên perwerdehiyê ve hem di pergalên li ser bîngeha yekzimanîyê de hem jî di pergalên li ser bîngeha pirrzimanîyê de, li serê sereketirîn diyarkerên ku bernamêyên perwerdehiyê encamên çawa bi xwe re tîne, taybetmendî, qabiliyet, ezmûnên pişeyî û zanîna pedagojîk a mamosteyan tê. Mamoste ji bo ku bikarin bibin kesên çalak ên guherînê divê bikarin vê rewşa heyî bikin mesele ji xwe re û bikarin bi awayekî rexneyî nêzîkî vê rewşê bibin. Li deverên ku polîtîkayên yekreng û bizava sereke tîk meşandin, mamoste wek teknîsyenên pasîf erka xwe tînin cih ku zanyariya nîvengên desthilatê bo xwendekaran diguhêzin. Di vê rewşê de mamoste, wek weznedarên di wê pergalê de ne ku Paulo Freireyê pedagojê rexneyî yê navdar ew wek modêla perwerdehiya bankgêr pênase kiribû. Li gorî vê, rol û erka mamoste wek serçaveyekê ye ku bi tenê zanyariyê dide. Xwendekar di rewşeke pasîf de ye, zanyariyên ku danê werdigre û wan jî ber dike. Ne mamoste ne jî xwendekar li zanyariyê nakole, wê şrove nake û rexne nake. Lênakole ku rûdanek an heqîqetek çima û çawa wisa dibe û xwe nade ber teyîdkirina wê. Berevajî vê, perwerdehiyê mamostetiyê ya veguhêr, dihêle ku berendamên mamostetiyê bi awayekî rexneyî nêzîkî dinyayê û têkiliyên civakî, yanî retorîkên desthilatê û şewazên jinûve afirandina bi berdewamî ya newekhevî û bêdaletiya civakî û siyasî û aborî ya sazîyên perwerdehiyê, bibe. Pirr dijwar e mirov bi carekê re bibêje ku perwerdehiyê veguhêr a bi vî rengî, çawa li bernamêyê mamoste-gîhandinê were sepandin, lê belê dîsa jî derbarê xalên hevpar ên bernamêyên bi vî rengî de mirov dikare van bibêje:

-Rê bê dayîn ku berendamên mamostetiyê derbarê pêwendiyên kulturî û civakî yê di nav de ne, bi awayekî rexneyî bifikirin,

-Amadekirina zemînên guncav bo xwendekaran ku da bikarin dinyayê û pêwendiyên civakî "bi dengê xwe" watedar bikin,

-Pêkanîna bîreweriya afirandina civakeke kesên wekhev di nava xwe de di hewîna ku li dora nîrxên demokratîk bi awayekî beşdar cih tê de bigrin.

Me jî ev xal jî xwe re kir palpişt û me biryar da ku em di vê broşurê de li ser mijara mamoste-gîhandinê, li rewşa heyî ya li Tirkiyeyê û li ezmûneyên welatên din bikolin.

Di nivîsa yekem de, li Tirkiyeya ku di warê mamoste-gîhandinê de kultureke yekrengîparêzî tê meşandin, pergala mamoste-gîhandinê di nav konteksta wê ya dîrokî de bi kurtî tê vegotin. Nivîs nişan dide ku guhertinên struktural ên di warê mamoste-gîhandinê de li Tirkiyeyê her



tim piştî derbeyên leşkerî û guherînên desthilatê derketine holê, lê van guherînên desthilatê di rastiyê de tu veguherînek neaniye li ser mijara cûrbicûriya zimanî û kulturî, berevajî vê feraseta yekrengparêz di demên desthilatên cuda de her tim bi heman awayî berdewam kiriye. Nivîsa duyem a di broşurê de, kesên bêyî ku statuyeke wan a fermî hebe mamostetîya Kurdî dikin li Tirkîyeyê, perwerdehiyeye bi çi rengî wergirtine tevî pêşveçûna wê ya dîrokî dike mijar ji xwe re. Di nivîsê de behsa armancên qursên mamoste-gihandinê û awayên wê yên xebitîne dike û dide xuyakirin ku çi perwerdehî jî tînin dayîn di van qursan de. Nivîsa di pey re jî wan tengasiyan ji xwe re dike mijar ku di rastiyê de ji ber rewşa zêde siyasibûyî pêk hatine di gihandina wan mamosteyan de ku di perwerdehiya zarokên xwedî statuya kêmîneyê ne de wezîfedar in li Trakyaya Rojava (li Yewnanîstanê herêma ku bi taybetî kêmîneya Tirkî lê diji). Nivîs nişan dide ku bi peymanê Lozanê re ligel kêmîneyên din ên misilman hindê maf hatine dayîn bo Tirkan, lê têkiliyên siyasî yên di navbera Tirkîyê û Yewnanîstanê de pîrr zêde bandorê li sûdwegirtina Tirkên kêmîne ji van mafan dike, digel ku carna zemîneke rehet heye di wextên din de sepandinên pîrr neadilane jî derdikevin holê. Nivîseke din jî behsa wê yekê dike ku li welatê Baskê gihandina mamosteyan ji aliyê cûrbicûriya zimanî û kulturî ve çawa tê organîzekirin. Ev nivîs, li pergala hîlbijartina wan mamosteyan û perwerdehiya wan wergirti hûr dibe ku piştî zimanê Baskî yê demeke dirêj hatî qedexekirin û çewsandin di dibistanan de wek zimanê perwerdehiyê hat bikaranîn pêdivî bi wan çêbû ku ev hem ji nav xelkê bi Baskî diaxivin hem jî ji nav mamosteyên Kastîlyan (Spanî) hatine hîlbijartin û handanên dewletê yên li ser vê mijarê derdixe pêş. Bi van aliyên xwe, eger zimanên demeke dirêj tûşî politîkayên tunehesibandin û çewsandinên cidî bûne wek zimanê Kurdî li Tirkîyeyê, bi awayekî li perwerdehiyê bê daxilkirin, li serê ezmûnên ku divê wek nimûne bînin girtin bêguman ezmûna welatê Baskê tê. Di nivîseke din de qala wê yekê tê kirin ku li herêma Katalonyayê gihandina mamosteyan çawa tê meşandin. Nivîs li wê yekê hûr dibe ku di mamoste-gihandinê de kîjan sazîyên dewletê rolên çawa hildidin ser milê xwe û statuya qanûnî çi ye. Nivîsa dawî ya di broşurê de jî, qala wê yekê dike ku li Perûyê gihandina mamosteyan piştî mêtîngeriya li gorî kozmolojiya zanyariya xwecihî ya Perûyê çawa ji nû ve tê sazîkirin û meşandin. Nivîs îdîa dike ku jinûve-sazîkirineke bi vî awayî li gellek deverên dinyayê li herêmên ku di heman qonaxan re derbas bûne derfetên nû dide dest qonaxên mamoste-gihandinê. Nişan jî dide ku ev guherîn wê tenê bi perwerdehiya zimanê xwecihî pêk neyê û hemû qonaxên ferasetêke nû ya perwerdehiyê çi ji aliyê naverokê çi jî rêbazê ve divê ji perspektîfêke ji perspektîfa gelê xwecihî bê sazîkirin. Herwiha em di vê nivîsê de dibînin ku di vê qonaxê de kesên ji gelê xwecihî hatî hîlbijartin digel ku di sazîyên dewletê yên wek zanîngehan de perwerdehî wernegirtine jî, bi perwerdehiyeye diyar a nêv-xizmetî dikarin tevî qonaxên perwerdehiyê bibin û van mamosteyan ji mamosteyên ku perwerdehiya fermî wergirtine bêhtir erkeke sûdewar hildaye ser milê xwe.

Di vê broşurê de ku li ser mijara mamoste-gihandinê ji aliyê cûrbicûriya zimanî û kulturî ve hatî nivîsandin, dibe ku gellek xalên divê hebin kêm mabin. Di nav mijaran de dibe ku sernavne wek awayên mamostetîya enformel, di cim'etên Ermenî, Cihû û Rûman de ku bi peymanê Lozanê re di statuya kêmîneyê de ne saziya mamostetîyê çawa dixebite û tûşî çi tengasiyan dibe, di semînarên perwerdehiya nêv-xizmetî de çi rû didin, pratîkên di polan de yên mamosteyên Kurdî, hebûna. Em hêvîdar in di xebatên piştî vê de li ser van mijaran û mijarên wek van lêkolînên bînin kirin û ev bi raya giştî re bînin parvekirin.

Şerîf Derince

Enstîtuya Diyarbekirê bo Lêkolînên Siyasî û Cîvahî



Li Tirkiyeyê Mamoste-Gihandin

Li Tirkiyeyê mamoste-gihandinê, ji damezrandina komarê û vir ve, erkên pîrralî daye ser milê xwe. Di komara nû de ji aliyekî ve di projeyên pêkanîna dabirraneke ji binî bi raboriyê re û belavbûna şewazên jiyana rojavayî û fikrên rojavayî de, ji aliyekî ve jî di projeyên afirandina welatekî homojen li ser bingehê kulturî û zimanî de, perwerdehî ji ber vê jî mamoste-gihandin cihekî giring girtiye. Lêbelê hê ji serî ve mirov nikare behsa wê yekê bike ku van bernamayan mamoste-gihandinê, her mamosteyek wek subjeyekê çalak di vê mijarê de li qelem dane. Bereksê vê, gellek ji mamosteyan pîrranî wek kesên pasîf hatine gihandin ku fikrên desthilatê û îdeolojiya fermî diguhêzin bo girseyan. Digel ku ji salên ewil ên komarê ve di bernamayan mamoste-gihandinê de reformên cûrbicûr hatibin pêkanîn jî armanca bingehîn a van bernamayan gihandina perwerdekarên ji nav wan mirovan bûye ku pêdiviya desthilatê ji bo mayîndetiya xwe bi wan heye.

Nivîsa li jêr bi taybetî gihandina mamosteyên li Tirkiyeyê di dibistanên seretayî de dixebitin ji xwe re dike mijar.

Bi Kurtî Dîroka Mamoste-Gihandinê

Piştî damezrandina komarê du cûre bernamayan mamoste-gihandinê hatin sepandin. Yek jî van, bernamaya Enstîtuyên Gundan e ku bêhtir gihandina wan mamosteyên li gundan bixebitin daye ber xwe; ya din jî dibistanên mamosteyan e ku perwerdekarên wê li bajaran mamostetiyê bikin digihîne. Mirov dikare bibêje ku her du cûre bername jî parçeyek e ji projeya “modernkirin”ê. Piştî sala 1954an partiya desthilat, enstîtuyên gundan girtiye û li şûna wê dibistanên mamosteyan ava kiriye. Berendamên ku di van dibistanan de perwerdehiyê werdigirin, piştî lîseyê bi qasî du-sê salan perwerdehiya mamostetiyê wergirtine û di dibistanên seretayî û yên navîn de mamostetî kirine. Lêbelê sala 1973an piştî derbeya leşkerî bi destguhertina desthilatê re, di mamoste-gihandinê de jî nû ve guherîn hatine kirin û erka mamoste-gihandinê bo dibistanên bilind ên mamosteyan hatiye spartin. Guherîna giring a piştî dîsa piştî derbeyeke din a leşkerî, yanî hema bi dû derbeya 1980yî re sala 1981ê hatiye kirin. Li gorî vê ev erk ketiye dirûvekî hê navendîtir û jî Lijneya Bilind a Hîndekariyê (YÖK) re hatiye hiştin ku bi qanûnên derbeya leşkerî hatiye damezrandin. Ji wê demê û vir ve nabe mirov bibêje ku di bernamayan mamoste-gihandinê de yên li Tirkiyeyê tîn meşandin guherînen giring hatine kirin. Bi ser de jî di vê serdemê de gellek dersên ji zanistên civakî yên wek “Civaknasiya Perwerdehiyê” ku berendamên mamosteyan ew di qonaxên perwerdehiyê de werdigirtin ji nav bernamayan hatine derxistin û bi vê yekê jî mamosteyan hatiye xwestin ku bêhtir bibin mamosteyên pasîf.



Gava em li van guherînên di bernamêyên mamoste-gihandinê de li Tirkiyeyê dinihêrin, em dibînin ku tevahiya guherînên giring piştî destguhartinê desthilatan pêk hatiye. Ev jî bi eşkereyî nîşan dide ku mamoste-gihandin çî qasî jî nêzîk ve têkildarî pêwendiyên desthilatê ye. Ji ber vê yekê, mirov dikare bibêje ku di qonaxên cuda de ew rêbaz û meylên di bernamêyên mamosteyan de hatine meşandin, bi hewcedariyên bo berdevamiya desthilatên serdemê re, bi giştî jî îdeolojiya fermî ya jî statukoyê re mutabiq bûne. Gava ev tê kirin, rêbaza pêşî ya ku tê meşandin li ser berendamên mamosteyan, dersên ku perwerdehiya wan pê de tên dayîn, xwendina deqên derbarê teorî û pratîkê de û li jêr kontrolê girtina perwerdekarên mamosteyan e. Li tevahiya welêt li gellek zanîngehên xwedî van bernamêyan, zankoyên perwerdehiyê yêr heyî bi gelemperî bi nêzîktêdayîneke bi vî rengî fealiyetên xwe berdevam dikin. Lêbelê wê ne rast be mirov bibêje hemû akademîsyenên di van zankoyan de li gorî vê perwerdehiyê didin. Lewra gellek akademîsyen bernamêyên ku li ser wan hatine ferzkirin bi heman awayî li xwendekarên xwe ranspêrin, li şûna wê nêzîktêdayînen alternatîf fêrî wan dikin.

Naverokên Bernamêyan

Bernamerêziya hîndekariyê (mufredat) ya di bernamêyên mamoste-gihandinê de tê meşandin, bi giştî li jêr bandora nêzîktêdayînen rojavayî tê amadekirin û dibe bê gotin ku pîrraniya deqên didin xwendin wergêranên xerab ên wan serçaveyan in ku li van welatan tên xwendin. Lewma pîrraniya serçaveyên di bernamêyan de, di amadekirina berendamên mamostetiyê de bo wê zemîna ku piştî dest bi wezîfeya xwe kirin wê li rastî bîn, kêr dimînin. Ji ber vê yekê nayê gotin ku naverokên dersên di bernamêyan de li pratîka mamostetiyê diguncin. Lewra pîrraniya van serçaveyan, bi nêzîktêdayînen pozîtîvîst ên rojavayî û bi pozîsyoneke diyar a çînî û kulturî ku fikra rexneyî bi pêş naxe hatine nivîsandin. Herwiha digel ku berendamên mamostetiyê bi salan derbarê teoriyên fêrbûn û fêrkirinê û perwerdehiya giştî de dersan werdigrin jî têra xwe wê derfetê bi dest naxin ku ka wê çawa fêrkirinê pêk bînin. Li şûna vê jî wan tê hêvîkirin ku herin hin dibistanan û bi awayekî pasîf çavdêriyê lê bikin û bi giştî jî wan nayê daxwazkirin ku derbarê kiryarên xwe de bi awayekî rexneyî bifikirin. Lewma gellek jî berendamên mamostetiyê, incex piştî ku dest bi mamostetiyê dikin pîrrî caran bi bikaranîna rêbazên ceribandî û xelîtinê heta bi astekê dikarin fêrî fêrkirinê bibin.

Gava mijar tê ser cûrbicûriya zimanî û kulturî ya li Tirkiyeyê, bernamêyên mamoste-gihandinê xwe bi yekcarî kerr û kor û lal dikin. Di hevdiînen ku ligel mamosteyan hatî kirin de tê ragihandin ku hemû mamoste qonaxên perwerdehiya xwe pê de derbarê kulturên cûrbicûr û zimanên tîr axaftin de li Tirkiyeyê tu ders wernegîrtine, mamosteyên zanîngehan jî li ser vê mijarê di dersan de devê tu nîqaşê venekirine û bi taybetî gava berendamên mamostetiyê yêr Kurd meseleya bikaranîna zimanê zîkmakî di perwerdehiyê de tînin zimên jî dengê wan tê birrîn. Gava li serçaveyên di bernamêyên mamoste-gihandinê de tên bikaranîn, li xebatên pîrraniya akademîsyenên dersan didin, li meqaleyên akademîk ên tîr nivîsandin û li tezên xwendekarên ku perwerdehiya xwe serlîsansê dikin di van bernamêyan de tê nihêrin, ev rewş pîrr bi eşkereyî tê dîtin.

Ji bilî fealiyetên mamoste-gihandinê yêr di zankoyên perwerdehiyê de tên meşandin, bi sedema pêşveçûna profesyonel a mamosteyên ku aniha mamostetiyê dikin, ji aliyê

wezareta perwerdehiyê ve her sal semînarên perwerdehiya nêv-xizmetî tên lidarxistin û bi van semînanan tê armanckirin ku rêbaz û nêzîktêdayînên nû bi mamosteyan bidin naskirin û tengasiyên di dibistanan de tên jiyîn bîn nîqaşkirin. Lê belê digel cûrbicûriya kulturî û zimanî ya di polan de nemeşandina mamoste-gihandinê di ser kultureke têra xwe homojen re, tu carî wek kêşeyekê nayê axaftin.

Gava mirov kêmbûna destmizên mamosteyan û diwariyên şert û mercên karkirina wan jî li van zêde bike, berendamên mamostetiyê û mamosteyên li ser kar ji bo xwe bi pêş bixin zêde tiştekî ku bikarin bikin di dest wan de namîne. Ji ber vê û sedemên wek vê, beşeke girîng ji mamosteyên li Tirkiyeyê li beramberî guherînan bi awayekî ironîk dikarin bibin kevneperisttîrîn alî. Ji ber vê yekê helwest û tevgerên pîrraniya mamosteyan li beramberî gellek meseleyên sosyo-kulturî û siyasî yên li Tirkiyeyê dikare bi alî astengdariyê ve be.

Ji aliyê Kurdan ve Mamoste-Gihandin

Li Tirkiyeyê hejmareke girîng a mamosteyên Kurd heye û ev mamoste li hemû herêmên Tirkiyeyê dixebitin. Li Tirkiyeyê derbarê cihên ku wê mamoste lê bixebitin de digel ku taybetmendiyên sosyo-kulturî yên mamosteyên wê bîn tayînkirin û deverên wê lê bîn tayînkirin li ber çav nayên girtin jî, bi taybetî bi riya tayîne gellek mamosteyên Kurd li herêma Kurdan dixebitin. Ev mamoste, di zankoyên perwerdehiyê de heman formasyonê wêrdigrin ku mamosteyên ne-Kurd wêrdigrin, lê belê digel ku Kurd in û pîrraniya wan bi Kurdî dizanin jî perwerdehiyê formel wernagirin ku pê bikarin van zanyariyan bi kar bînin. Bi ser de pîrraniya mamosteyên ku bi Kurdî dizanin bi zimanê xwe yê zikmakî xwendin û nivîsandinê nizanin. Li ser vê mijarê ne zankoyên perwerdehiyê ne jî saziyên gelemperî yên mamoste pabendî ne, ne di nav karûbarekî hander de ne. Bereksê vê, mamosteyên ku bi derfetên xwe dikevin nav karûbarekî xwendin û nivîsandina Kurdî jî gellek çaran tûşî lêpîrsînên edlî û îdarî yên cûrbicûr dibin, û nayê hiştin ev mamoste di dibistanên xwe de bi xwendekarên xwe re an jî bi mamosteyên din re bi Kurdî biaxivin. Lê belê lêkolînên hatî kirin nîşan daye ku cihgiritina mamosteyên Kurd in û bi Kurdî dizanin di qonaxên perwerdehiya xwendekarên Kurd de, ji aliyê xwendekaran ve karîgeriyeke wê ya pîrr girîng heye.

Ger bi kurtî bê gotin, li Tirkiyeyê mamoste-gihandin, wek qadên din ên perwerdehiyê têra xwe xwedî naverokeke politîk e û ev yek dîroka komarê pê de wisa bûye. Bernameyên mamoste-gihandinê, li ser rê û rêzana nêzîktêdayîna fermî û ya desthilatê bi piştguhkirin û tune hesabandina berjewendiyên komên serdest tên meşandin. Ji ber van sedeman li ser mijarên cûrbicûriya kulturî û zimanî ya li welêt mamosteyan naghîne, bereksê wê dihêle ku ew vê cûrbicûriyê wek gefekê bizanin û civakê dike maşîka projeyêke homojenkirin û modernkirina dikteyî.

Şerif Derince



Li Tîrkiye û bakurê Kurdistanê xebatên hînkirina kurdî ji hêla sazîyên kurdan ve bi mebesta parastin û pêşbirina kurdî û nasnameya kurdî hatine kirin. Sazî û dezgehên kurdî yên siyasî, civakî û çandî her tim di nav hev de hatine meşandin.

Bo nimûne yekemîn berhema fêrkirina kurdî ji hêla Hêvî Civaka Telebeyê Kurdan ve di sala 1921'ê de hatiye çapkirin.¹ Ev berhema bi navê "Hînkere Zimanê Kurdî" (heke em Nûbihara Biçûkan a Ehmedê Xanî bidin aliyekî) yekemîn berhema hîndekariyê ya kurdî ye. Mamosteyên zimanê kurdî jî bi gelemperî ji nav têkoşerên doza kurdî derketine. Bo nimûne danerê alfabeya kurdî ya latînî û xwediyê kovara Hawarê ji aliyê pîşeyî ve hiqûqnas e. Her wiha piraniya zimanzanên kurd ku derbarê zimanê kurdî de berhem dane û di hin saziyan de kurdî fêr kirine, ji aliyê pîşeyî ve ne mamosteyên perwerdekirî ne. Kesên mîna Osman Sebrî, Kemal Badîllî, Dr. Şivan, Feqî Huseyn Sağniç her yek ji wan pîşekarê karekî cuda ye. Tiştê ku wan digihîne hev doza azadiya gelê kurd û parastin û pêşvebirina zimanê kurdî ye.

Piştî avabûna Tîrkiyeyê xebatên hîndekariya kurdî bi awayekî veşartî hatin kirin. Ji ber ku kurdî bi awayekî tund hatibû qedexekirin, bi tenê di medreseyan kurdî de bi awayekî nehênî zimanê kurdî dihat fêrkirin. Lewma jî meleyên kurd di warê parastin û pêşvebirina zimanê kurdî de xwediyê rist û peywireke taybet in. Her wiha xwendevanên şoreşger ên zanîngehan jî di warê pêşvebirina kurdî de hin xebat kirine.

Xebatên derbarê fêrkirina kurdî de piştî cûntaya leşkerî ya 12'ê rezbera 1980'yî bi gelemperî li Ewropayê hatine kirin. Piştî avabûna Enstîtuya Kurdî ya Parîsê di warê pêşvebirina zimanê kurdî de xebatên gîranbiha hatine kirin. Di vî warî de divê mirov xebata Kovara Kurmancî bi bîr bîne. Lê mirov dikare bi hêsanî bibêje ku navenda xebatên hînkirina kurdî Swêd bû. Li vî welatî bi saya serê waneyên zimanê dayikê (zimanê malê) ku piştî kutabûna waneyên swêdî têne dayîn, gelek materyalên fêrkirina kurdî û nasandina çand û dîroka kurdî hatine amadekirin û gelek kes jî bi salan e ku mamostetiya zimanê kurdî dikin. Li gorî nûçeyêke ku di malpera www.dibistanakurdi.com de cih girtiye, sala 2011'an zêdetirî deh hezar zarokên kurd beşdarî waneyên zimanê dayikê dibin.²

Li gorî nûçeyêke din a di heman malparê de jî heftemîn konferansa mamosteyên kurd ên li Swêdê pêk hatiye û 70 mamoste beşdarî vê konferansê bûne. Divê em bidin xuyakirin ku ji bilî Swêdê li hinek welatên din ên Ewropayê jî waneyên zimanê kurdî hene. Ligel ku ev qas şagirt û mamoste hene jî nebûna zanîngeheke ku mamosteyên kurdî lê perwerde bibin cihê

şerm û xemgîniyê ye. Piraniya mamosteyên ku îro mamostetîya kurdî dikin, mixabin tenê bi zimanên din perwerde bûne.

Piştî van agahiyên gelemperî yê derbarê hîndekariya kurdî de îcar em dikarin derbas bibin mijara xwe ya esasî. Li Tirkiyeyê ji salên 1990'î vir de kurd bi kursan zimanê kurdî fêr dikin. Fêrkirina zimanê kurdî heta sala 2004'an bi awayekî veşartî û bi kursên nehênî dihat kirin, ji ber van kursan deriyê Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê û Kurt-Kavê hate morkirin. Di van salan de xebatên fêrkirina kurdî li Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, NÇM û avahiyên partiyên kurd (DEP, HADEP û hwd.) dihat kirin. Kursên zimên ên li avahiyên partiyên kurd ji hêla xebatkarên Azadiya Welat û Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ve dihatin dayîn.

Li hin şaxên NÇM'ê, nemaze jî li şaxa Îzmîr û Edeneyê xebatên bi vî rengî dihatin kirin. Cara pêşîn bernameyek ji bo gihandina mamosteyên kursên kurdî di sala 2000'î de bi hevkarîya Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê û Kedkarên Welatparêz hat lidarxistin. Vê bernameyê ji 15 rêbandanê heta 15'ê reşemiyê yanî mehekê dom kir û 40 kesên jî bajarên cur bi cur beşdarî van kursan bûn.³ Kesên ku beşdarî bernameyê bûn hemû kedkar bûn û piraniya wan jî mamoste bûn. Piraniya van kesan piştî 5 salan di kursên fermî de mamostetî kir. Di van kursan de dersên rêziman û rastnivîs, dîrok û wêjeyê hatin pêşkêşkirin. Di destpêka sala 2005'an de ji bo mamosteyên kursên fermî kurseke 15 rojî pêk hat. Piştî ku kursên fermî di dawiya sala 2005'an de hatin girtin, di 2006'an de TZPKurdî dest bi xebatên xwe kir.

TZPKurdî di bin banê saziyên mîna Kurdî-Der, Kurd-Der, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê û Enstîtuya Kurdî ya Amedê de xebatên xwe didomîne. Dewreyên mamosteyê her sal li herêmên cur bi cur têne amadekirin. Her herêm li gorî rewş û derfetên xwe mamosteyan digihîne. Hin caran jî dewreyên navendî têne amadekirin. Lê waneyên dewreya mamostetiyê li gorî bernameyê hevpar têne dayîn. Di van dewreyan de waneyên rêziman û hişmendîya zimanê kurdî, rêbazên fêrkirinê zimên, dîrok û wêjeya kurdî têne dayîn.

Di nav TZPKurdî de karên hîndekariyê ji hêla Meclisa Perwerdehiyê ve tê birêvebirin. Mamoste bi piranî ji nav kesên ku mamostetîya fermî dikin têne neqandin. Di destpêka avakirina Meclisa Perwerdehiyê "Komîsyona Gihandina Mamosteyan" hate avakirin, lê mixabin xebata komîsyonê pir qels ma. Bo nimûne vê komîsyonê di sala 2010'an de ji bo asta mamosteyan bernameyek amade kiribû ku dersên mîna Dîroka Kurd û Kurdistanê, Ziman û wêjeya kurdî, Armanc û bernameyên TZPKurdî, Bişaftin û xwebişaftin, Ragihandin, Rêvebirina polê, Teknik û awayên hînkirinê, Bikaranîna Materyalan, Hînkirina Qabiliyetên Zimanî bide berendamên mamosteyan. Her wiha hinek armanc jî hatin destnîşankirin. Bo nimûne, hate armanckirin ku berendamên mamoste her wiha bibin aktivîstên zimanê kurdî, di darsa dîroka zimanê kurdî de berendam danasîna zaravayên xwe bikin û bi zaravayên din re hevrû bikin, ji kesên nivîskar, hunermend û pispor alîkarî bê xwestin, ew jî werin semîneran pêşkêş bikin bo berendamên û hwd.

Ev bernameya li jor kêm zêde li hemû herêmê tê bikaranîn, lê pîvanên diyarkirî bi tenê li ser kaxizê man. Di navbera mamosteyan de têkilî û danûstandîneke xurt nîn e. Lewre jî her herêm li gorî pêdivî û derfetên xwe mamosteyan digihîne. Bi tenê salê carekê konferansê



Meclisa Perwerdehiyê pêk tê û di vê konferansê de hinek nîqaş li ser kursan têne kirin û mamoste ezmûn û tecrûbeyên xwe parve dikin. Ji bo perwerdekirina pişeyî heta niha tu xebata gelemperî nehatiye kirin. Lê herêma li gorî pêdiviyên xwe hin xebatên perwerdekirina perwerdekarên dikin. Bo nimûne di sala 2010'an de li Amedê xebateke bi vî rengî hate kirin. Wekî encam em dikarin bibêjin ku di gel hemû tengasî û astengiyên jî bi têkoşîna gelê kurd hêzeke hindekariya kurdî derketiye holê. Salane nêzî deh hezar kes beşdarî kursên saziyên TZPKurdî dibin. Di warê fêrkirina kurdî bi sedan mamoste gihastîne û hêz û tecrûbeyek derketiye holê.

Piraniya van kesan kesên xwende ne, bi taybetî jî mamosteyên fermî ne. Hejmareke mezin a mamosteyên kurdî ji ciwanan pêk tê. Hejmara jinan gelekî zêde ye. Mamosteyên kurdî bi dilxwazî û fedekarî vê xebatê dikin. Hêz û tecrûbeyeke berbiçav derketiye holê, lê ji ber nebûna derfetên aborî û mafên perwerdehiya bi zimanê kurdî, ev xebat bi amatorî têne meşandin, lewre jî zêde geş nabin. TZPKurdî wekî tevgerê sîvîl û demokratîk di vî warî xizmeteke baş dike, lê belê di warê avakirina pergaleke perwerdehiyê de qels û lawaz dimîne.

Her wiha hişmendiya teng û tengbînî pir caran rê li ber beşdariya mirovan digire, bi hezaran mamosteyên kurdî ji ber helwesta teng li derveyî vê xebatê dimînin. Heke TZPKurdî wekî bi hişmendiya tevgerê sîvîl û girseyî tevbigere dikarî pergaleke perwerdehiya alternatîf derxe holê û politikayên pişaftinê pûç bike û di warê mafê perwerdehiyê de hin gav bi dewletê bide avêtin. Mixabîna xebat û gêşedanên bi vî rengî pêk nehatine.

Aliyekî din ê rastiyê jî têkildarî rewşa kurdan e. Ji bo ku pergaleke perwerdehiya bi kurdî pêk were divê kurd bibin xwediyê statûyekê û zimanê kurdî jî bibe zimanê perwerdehiyê.

Sami Tan

1 Hînerê Zimanê Kurdî, bgst yayinlari, Stenbol, Kewçer 2008

2 <http://modersmal.skolverket.se/nordkurdiska/>

3 Mustafa Borak "Rewşa fêrkirina kurmançî li Tirkîyeyê", Konferansa Parastin û Perwerdehiya Kurdî, Weşanên Şaredariya Bajarê Mezin a Diyarbekirê, Sermawez 2006, Amed.



Mamoste di Perwerdehiya Kêmineyan de li Trakyaya Rojava

Mijara kêmineyan di navbera Tîrkiye û Yewnanistanê de ewqasî bûye bazareke siyasî û navgîneke zext û çewsandîne ku bêyî îdeolojiyên neteweyî nabe mirov qala “perwerdehiya kêmineyan” bike. Mijarên perwerdehiyê yê mîna mijara perwerdehiya zimanê zîkmakî, kitêbên dersan ên ku bîn bikaranîn û mijara mamosteyan êdî bûne hesabên neteweyî. Bêyî ku mirov pîlanên îdeolojîk ên dewletan li ber çavan bigre, fêmkirina çibçîkirina bernamayan jî ne pêkan e; hişmendiya van kirinan, tenê gava xem û hessasiyetên neteweyî û neteweperestî li ber çavan hat girtin, dikare bê fêmkirin.

Li Tîrkiyeyê û Yewnanistanê, piştî pevguhêstina nifûsê ya dualî ku sala 1923an hat bicihkirin bi Peymana Lozanê, li Tîrkiyeyê hebûna kêmineyên Yewnan (an jî Rûm) li Stenbol, Îmroz (Gokçeada) û Bozcaadayê; û li Yewnanistanê li Trakyaya Rojava hebûna kêmineyên Tîrk (an jî Misilman) hate qebûlkirin. Lêbelê nasname û maf û heta bi navên van kêmineyan jî heta niha jî bûye mijara nîqaş û devjeniyê. Li gorî pêdaçûna têkiliyên di navbera her du welatan de, kêminê carna bi wan çêbû jiyanê rehetir derbas bikin, carna jî li rasta zext û zoriyên cûrbicûr hatin. Perwerdehiya wan jî di van qonaxên nerêkûpêk ve derbas bû.

Di vê çarçoveya giştî de hat kirin ku mamosteyên kêmineya Trakyaya Rojava jî tûşî sepandinên cihêreng bûn. Salên pêşîn li jêr siya rêgeza beramberîtiyê, kêminê di dibistanên kêmineyan de fêrbûna zimên bi riya mamosteyên ji nav rewşenbîrên xwe berdewam kirin. Bi hindêk protokolên ku salên pêwendiyên her du welatan baş bûn hatin îmzekirin, rewşa mamosteyan jî nû ve hat sazîkirin. Li gorî van protokolên, di çarçoveya rêgeza beramberîtiyê de, mamosteyên bi jimarekê sînorkirî ku ji aliyê wezaretê perwerdehiyê ya her du welatan ve hatî hilbijartin, dest bi dersdanê kirin di dibistanên kêmineyan de ku li welatê din dijîn. Mamosteyên kêmineyan bi xwe jî dersdana xwe berdewam kirin. Bi vî awayî li Trakyaya Rojava di dibistanên kêmineyan de dersên wek zimanê Tîrkî û matematîkê, bi pirtûkên ku li Tîrkiyeyê hatî amadekirin û ji aliyê meqamên Yewnan jî hatî pesendkirin û ji aliyê mamosteyên ku ji Tîrkiyeyê hatî jî hate dayin.

Ev sepandin jî ber du sedeman (an jî bi behaneyan) tûşî kêşeyan bû. Gava di navbera her du welatan de –di serî de meseleyên Qîbrîsê û Deryaya Egeyê– lihevnekirin rû dan, di şandina van mamosteyan de kêmkurî derketin. Mamosteyên hatî şandin jî bo dest bi kar bikin nekarîn destûrên pêwîst wergirin an jî ev destûr bi zanebûn hatin derengxistin. Aliyê Yewnan bi êşkerekirina ku nifûsa kêmineya Yewnan/Rûm pîrr kêmbûye li Tîrkiyeyê û li gorî rêgeza beramberîtiyê hewl da ku jimara mamosteyan kêmbike. Ev rewş bi awayekî xwezayî jî bo kêmineya Trakyaya Rojava bû cihê dirûstbûna kêşeyan.



Di deh salên dawiyê de li Tirkîyeyê, endamên kêmîneya Trakyaya Rojava yên hemwelatîyên Yewnan jî ku xwendina xwe ya bilind qedandine, wek mamoste dest bi xebatê kirin di dibistanên kêmîneyan de. Xuya ye bi armanca ku “bandora” Tirkîyeyê kêm bikin, hikûmetên Yewnan li jêr çavdêriya dewletê Akademiya Pedagojiyê ya Taybet a Selanîkê (SÖPA) damezirand û dest bi gihandina mamosteyên zimanê Tirkî kir jî bo dibistanên kêmîneyan. Li gorî bawerîyeke ku di nav xelkê de belavbûyî, pêşî xwendekarên bi eslê xwe Pomak hatin wergerîtin bo van dibistanan. Di vê akademiyê de endamên hindekariyê bi pirranî kesên ji koma etnîk a Yewnan bûn. Him serekên kêmîneyê him jî Tirkîye li hemberî vê akademiyê nerazîbûna xwe nîşan da; hat gotin ku him di hindekariyê de kêmasî hene, netêr e û him jî dilxerabiyekê di xwe de dihevine; herwiha hat parastin ku armanca wê ew e nasnameya kêmîneyê jî holê rake.

Li gorî sepandina nû ya îsal SÖPA (Akademiya Pedagojiyê ya Taybet a Selanîkê) hat girtin û karê gihandina mamosteyan bo kêmîneyan sipartin “Beşa Kêmîneyan” ku di Zanîngeha Arîstoteles a Selanîkê de hat vekirin. Li gorî bîrûboçûna fermî mamosteyên ku wê di dibistanên kêmîneyan de erka xwe binin cih, ji vir û pê de di zankoya perwerdehiyê de bi kesên ji beşên din derçûne (mezûn bûne) re wê di heman statûyê de bin. Bi vê beşa kêmîneyan ku di bin banê zanîngehê de hatî vekirin, wê kêşeya nebûna mamosteyan jî holê bê rakirin. Di vê beşê de her sal wê bîst û yek xwendekar wek mamoste bîn gihandin.

Ev vesazkirin wek ku gazincên kêmîneyan ên derbarê SÖPAyê de jî holê radike; perwerdehiya mamosteyan êdî li asta zanîngehê tê bilindkirin. Lê dîsa jî hinek guman di rojevê de ne. Hin ji endamên kêmîneya Trakyaya Rojava, di beşa ku wê di bin banê zanîngehê de bê damezrandin û têkeve şûna SÖPAyê, daxwaz kiribûn ku tenê kesên mensûbê kêmîneyê ne xwendina xwe bikin. Meqamên têkildar jî li ser wê rayê ne ku wê ev mijar dijberî rêgeza wekhevîyê be ku bi zagona bîngehîn a welêt hatî destnîşankirin.

Mîna ku wê jî van nêzîktêdayînan jî bê fêmkirin, nîqaş û sepandinên gihandina mamosteyan bo dibistanên kêmîneyên ku zimanekî cuda bi kar tinin, ji xemên fêrbûn û fêrkirinê wêdetir diçin. Mijara ku ka wê ev kêmine di bin bandor û çavdêriya kê de be jî aliyan eleqedar dike. Aktor, dewletên Yewnan û Tirk, û kêmine bi xwe ne. Helbet kêmine jî ne tevahîyek e û di nava xwe de hişmendiyên cihêreng dihevine. Herwiha yên ku wek zimanê zikmakî zimanê Tirkî diparêzin, dibêjin Pomak bi zimanekî cuda dipeyivin û naxwazin li ser fêrkirina vî zimanî nîqaşê jî bikin. Taybetmendiyeke din a kêmîneyê ew e ku her tim çareseriyên ji dewletan hêvî dikin: ji dewleta Tirk an ya Yewnan. Insîyatîfa wan bi xwe pirr sînordar e. Ev tevgerên wan ne ji bêkêrriyê ye –lewra di nav endamên kêmîneyê de yên xwedî xwendina bilind pirr in-, lêbelê mirov bibêje ku ev yek jî ber ku endamên kêmîneyê wek kes hê neketine nav hewldanên bi vî rengî, pêk hatiye wê rasttir be.

Penda bîngehîn ku mirov jî vê ezmûneyê bigre ew e ku mijara ziman û mamosteyan kêmîneyan, ji kêşeyeke teknîk û hiqûqî derbarê perwerdehiyê de bêhtir, warekî îdeolojîk û siyasî ye ku her du dewletên navborî jî tê de rolê xwe dilîzin. Kêmine gava wek biyanî an jî dûvebiyanî hatin dîtin, her bi gumanbarî li wan tê nêrîn, tîn havîkirin û pêdivî û daxwazên wan jî nayên temînkirin. Hin sepandin siyasetên bişaftinê (asîmilasyonê) tînin bîra mirov. Gava em li aliyê din ê meseleyê binêrin, endamên kêmîneyê gava li welatê lê dijîn xwe wek “hemwelatî” nehesibandin, xwe wek welatîyê welatê cîran dîtin û bi ser de jî xwe wisa nîşan dan, vê carê jî dibin sedema bêbawerîya “zorîneyê” û dewletên xwe. Ger bi awayekî din bê gotin, kêmîneyan her ku di çarçoveya “neteweyî”yê doza mafên xwe kir, tûşî bertekên netewî û netewperestî dibin. Şerên neteweyî bi gîştî bi “alîkarî”ya her du aliyan jî cor dikin û daxwaza perwerdehiya bi zimanê zikmakî ku mafê bêgunehtîrîn mirovî ye gava wek navgîna derbirrîn û bihêzbûna nasnameyeke netewî hat pêşkêşkirin, şer jî zêdetir dibin.



Li Welatê Baskê Gihandina Mamosteyan

Mamosteyên di dibistanên seretayî te dixebitin divê ji xwendegeheke mamosteyan sertîfîkaya mamosteyan wergirin, mamosteyên di dibistanên navîn de dixebitin jî divê dîplomaya zanîngehê û dersên taybet ên pêş-xizmetê wergirin. Gava Qanûna Asayîkirina Zimanê Baskî sala 1982yan hat pesendkirin, ji mamosteyên ku di dibistanên dewletê de dixebitin inçex li dor %20î dikarî bi Baskî biaxive û pirr kêm kesan ji van xwendin û nivîsandina bi vî zimanî dizanî. Îro tê hêvîkirin, mamosteyên ku zimanê Baskî fêr dikin an jî perwerdehiyê bi bîngehê Baskî didin, xwedî sertîfîkaya besatiya zimên bin. Îro mamosteyên di dibistanên dewletê de dixebitin bi qasî %80yê wan di asteke baş de bi Baskî dizanin û ji bo bikarin perwerdehiya bi Baskî bidin bûne xwedî dîplome. Her wiha mamosteyên di dibistanên taybet de dixebitin jî li dor %63yê wan di wê astê de ne ku bikarin perwerdehiya bi Baskî bidin.

Ev jimar têra xwe tesîrbar in û dide xuyakirin ku perwerdehiya Baskî di rewacê de ye. Baş e, ev mamosteyên bi Baskî diaxivin kî ne? Hinek ji wan mamosteyên nû ne ku zimanê wan ê zikmakî Baskî û Spanî ye û di xwendegehên mamosteyan de an jî di zankoyên perwerdehiyê yên zanîngehan de di perwerdehiya bi bîngehê Baskî re derbas bûne. Hema hema mamosteyên nû tev di zimanê Baskî de xwedî besatiya di asteke baş de ne. Lêbelê di van demên dawî de daketina rêjeya jidayîkbûnê û ji ber vê jî kêmbûna jimara xwendekaran di dibistanan de, bi qasî berê mamosteyên nû nagîhin. Mamosteyên di dibistanên dewletê de dixebitin tev ji ber ku karmendên xwedî kadr in, rêbaza sereke ya pêşvebirina besatiya zimanê Baskî ji bo van mamosteyan ew e ku beşdarî semînerên perwerdehiya nav-xizmetî bibin. Wezaretê Perwerdehiyê ya Hikûmeta Baskê, ji bo mamosteyên dixwazin fêrî Baskî bibin an jî divê fêr bibin, dersan lê zêde dike û ji bo saetên dersan ên van mamosteyên beşdarî dersan dibin, mamosteyên cîgir wezîfedar dike. Her wiha mamoste, heta sê salan bêtir ji destmiza (destheq) wan bê birrîn, dikarin destûrê wergirin ji bo beşdarî dersên Baskî bibin. Di 20 salên dawî de nêzîkê 23,000 mamosteyan ji vê destûrê sûd wergirtine. Mamosteyên beşdarî van qursan dibin ji bo îsbat bikin ku xwedî besatiya zimên in da bikarin bi zimanê Baskî perwerdehiyê bidin, divê têkevin ezmûnan. Salên dûredirêj pê de mamoste ji bo bikarin beşdarî van qursan bibin, divabû bi hewldanên xwe bi riya qursên ji derve bi kêmanî di asta navîn de bi Baskî bizanin; lêbelê bi guhartinên hatî kirin êdî mamosteyên di asta destpêkê de jî dikarin beşdarî van qursan bibin. Ji bilî vê, van demên dawî rê li ber mamosteyên di dibistanên taybet de dixebitin jî hatiye vekirin ku destûra bi destmiz wergirin û beşdarî qursên Baskî yên bi vî rengî bibin. Bi vî awayî, mûçeyên (mehane) mamosteyên li dibistanên taybet dixebitin û dixwazin beşdarî qursên Baskî bibin û yên mamosteyên cîgir ku wê li şûna wan wezîfeyê bikin jî ji aliyê Hikûmeta Baskê ve tê



dayîn. Herwiha vê gavê ji bo ku mamosteyên perwerdehiya Baskî didin jî besatiya xwe ya zimên bihêz bikin û ji xebatên nû yên derbarê standardîzekirina zimên û termînolojiyê de agahdar bibin, qursên tev-wextî an jî nîv-wextî hene. Berî bi demekê ji bo mamosteyên zimanê wan ê zîkmakî Baskî ye û perwerdehiya Spanî didin, vekirina qursên Baskî pratîkeke gellekî berbelav bû û armanc ew bû ku bi saya van qursan mamoste bi zimanê Baskî ku bêhtir wek zimanê axaftinê bi kar dianîn, xwendin û nivîsandinê bi pêş bixin û zanîna xwe ya rêziman û bêjeyan dewlemend bikin. Bikaranîna Baskî ya bi vî awayî ku her diçe hê bêhtir di perwerdehiyê de cih digire, tê wê wateyê ku Baskî di warên berî niha nehatî bikaranîn de jî her diçe bihêztir dibe.

Ya rast li welatê Baskê ji bo mamosteyan şertûmercên fêrbûna Baskî pirr guncav in. Lê dîsa jî dibe ku hinek mamoste hin tengasiyan bikşînin. Wek nimûne malbat daxwaz dikin ku zarokên wan pirranî perwerdehiya hê zêde Baskî bibînin. Di vê rewşê de beşek ji mamosteyan naçar dimînin ku herin dibistanên din ên perwerdehiya Spanî didin. Bi taybetî mamosteyên temenê wan di ser 45an re didin xuyakirin ku êdî derbarê fêrbûna zimên de tengasiyê dikşînin û ji şertekî bi vî rengî bêrî dibin. Lewma derbarê besatiya zimên de ku berê ji bo perwerdekirina bi Baskî hewce bû, ji bêgavî asta standardan kêm hatiye girtin.

Bi saya semînerên nêv-xizmetî îro hema bêje hemû mamoste duzimanî ne. Lêbelê her çend Baskî zimanê duyem ê gellek mamosteyan e û dîplomeyên wan ên besatiya zimên hene, wisa bîr dikin ku perwerdekirina bi Baskî ji bo wan zehmet e. Hinek xebat nişan didin ku ji ber vê rewşê gava perwerdehiya bi bîngê Baskî tê dayîn bo xwendekarên ku zimanê wan ê yekem an yê duwem Baskî ye, dibe ku serkeftina akademîk heta bi rêjeyeke aşkere bikeve.

Hemû mamoste, gava pêdiviya wan pê çêbû, navendên ku ji pisporan şewirmendiya perwerdehiyê wergirin hene. Ji van navendên ku Wezaretê Perwerdehiyê ya Hikûmeta Baskê piştgîriya wan dike bi giştî 18 heb hene. Li hemû navendan koordînatorek zimansaziyê (plankirina zimên) heye. Li gorî rêznameya Wezaretê Perwerdehiyê armanca van navendan ew e ku li ser mijarên zanistên perwerdehiyê, bernamêyên taybet, materyal û perwerdehiya nêv-xizmetî şewirmendiya mamosteyan bikin û di warê fêrbûna zimên de ezmûn û lêkolînan bidin meşandin. Ji bilî plankirina zimanê Baskî di van navendan de li ser mijarên cihêreng ên wek teknolojiyên nû, perwerdehiya Ingilîzî, pêdiviyên taybet bo xwendekaran û cûrbicûriya zimanî û çandî wezîfedarên pisporbûyî hene. Hin dibistanên dewletê û dibistanên taybet jî personelên wan ên taybet bi xwe hene ku li ser van mijaran xebatê dikin. Ji bo mirov di bernamêyên duzimanî an pirzimanî de bikare mamosteyiyê bike, di warên wek perwerdehiya pirzimanîkirinê, bernamêya hîndekariyê, materyal û çavkanî û nirxandina zimanê armanc de divê perwerdehiyê taybet wergirtibe. Li welatê Baskê ji bo di van waran de perwerdehiya pêwîst bê dayîn her sal nêzîkî bi qasî 200 dersan tê dayîn. Beşek ji van dersan li ser tabloya li jêr hatiye destnîşankirin.

Berî Dibistanê (Pêş-dibistanî)	Lîstikên xebata komê Wek navgînekê şano Di perwerdehiya berî dibistanê de ragihandina devkî
Dibistana Seretayî	Fêrbûna fêrbûnê û fêrbûna fikirînê Têgihîştina nivîsarê (deq, tekst) û afirandin Çavdêriya polê
Dibistana Navîn	Besatiya di ragihandina zimanî de Di hîndekariya zimên de wek navgîneke pedagojîk blog Bernameya hîndekariya zimêm a nû
Gelempêrî	Texteyên dijîtal

Ji aliyekî din ve mamosteyên ku di bernameyên duzimanî an pirrzimanî de dixebitin, kêşeyên wan ên taybet bi xwe ve jî hene. Pêwîst e dersê bidin komên têkel ku li welatê Baskê xwedî tiwanatiyeke zimên a cuda ne. Wek gellek lêkolînan nîşan daye, amadekirina mamosteyan bo cûrbicûriya zimanî û çandî bi qasî tê hêvîkirin ewqasî jî sext e. Herwiha mamoste derbarê wê yekê de jî hin tengasiyan dikşînin ku Baskî bûye statûya zimanê kêmîneyê. Zimanê zikmakî yê gellek mamosteyan ne Baskî ye û yên zimanê wan ê zikmakî Baskî ye jî ji ber ku Baskî di bikaranîna ji bo armancên akademîk de xwedî dîrokeke pirr kurt e, bi têra xwe nikarîne tiwanatiyên xwe yên xwendin û nivîsandiniyê bi pêş bixin.

Ji aliyekî din ve jî dîsa wek gellek lêkolîneran gotî, mamosteyên di qonaxa fêrbûna zimanekî nû re derbasbûyî, pêdiviyên xwendekarên di heman qonaxan re derbas dibin ji mamosteyên takezimanî (yekzimanî) hê baştir dizanin. Xwedîbûna lêhaybûneke bi vî rengî ji aliyê perwerdehiya di bernameyên duzimanî an pirrzimanî de gellekî giring e.

Prof. Dr. Jasone Cenoz

*Zimanzaniya Tetbîqî, Beşa Lêkolînên Perwerdeyî
Zanîngeha Welatê Baskê*

Têbînî: Ev nivîs ji pirtûka bi navê Towards Multilingual Education: Basque Educational Reserach from an International Perspective hatiye girtin û wergerandin. Nivîs eslê xwe beşê nivîseke dirêjtir e û li hemû sîstema perwerdeya Welatê Baskê dike. Lê belê vîra li gor armancên broşûrê tenê ev beş hatiye girtin.



Gihandîna Mamosteyan li Katalonyayê

Piştî qedexeya dijwar a 30 salan a li ser bikaranîn û perwedeya zimanê katalanî, di salên dawiyê yê dîktatoriya Franco de qedexeya li ser ziman sist bû. Di 1970-71'an de destûr hat dayîn ku li hemû aliyê Spanyayê zimanên xwecî qasî çend saetan bên fêrkirin. Piştî xweseriya Katalonyayê ya 1978'an, di heman salê de bi biryara dewletê katalanî bû zimanê mecbûrî ya perwerdehiya pêş-dibistan, dibistana seretayî û ya navîn a li Katalonyayê. Statûya Xweseriyê ya 1979'an û bidestxistina hemû besatiyên qada perwerdehiyê ya 1980'an kir ku Katalanî ligel spanyolî bibe zimanê navgîn ê hemû astên perwerdehiyê. Qanûna Ziman a 1983'an û bi qanûnên din ên li dût vê hatin, qada bikaranînê ya ji bo zimanê katalanî gelek fireh kirin.

Berfirehbûna katalanî ya di sektora perwerdehiyê de her çiqas di nava pêvajoyek dûvedirêj de bi awayekî bi îstikrar pêş ketibe jî rêveberiya katalan di gavên xwe yê ewil de rastî problemek mezin hatibû. Ji ber xisara sîstema asimilasyonîst a spanyol % 75'ê mamosteyên li Katalonyayê bi katalanî nizanibûn. Herwiha % 60'î nifûsa otokton ê katalan bi zimanê xwe diaxivîn lê bi katalanî nehatibûn perwerdekirin. Lewma beriya meşandina pîlan û hedefên perwerdeyê ku bi Qanûna Normalkirina Ziman a 1983'an hatibûn diyarkirin, divê hîndekariya mamoste û her cûre xebatkarên perwerdeyê bihatana kirin.

Ji bo çareserkirina vê problemê di 1981'an de sîstema Veçerxa Mamosteyî (teacher recycling) ku ji du çerxan (cycles) pêk dihat hate meşandin. Bernameya vê sîstemê ji aliyê Enstîtuyên Zanista Perwerdeyê ku girêdayî zanîngehên li welat bû di hate meşandin. Di sala 1986'an de mamosteyên ewilî yê ku ji vê bernameyê mezûn bûne bûn mafê fêrkirina katalanî li dibistanên seretayî. Paşê jî di sala 1987'an de rêvebiriya katalan Generalitat gihîşt wê biryarê ku vê sîstemê peywira xwe bi cî anîye û lewma jî wê da sekinandin.

Vê modela fêrkirinê ya Katalonyayê ku pirî caran wekî "pergala yekzimanî" tê naskirin bi armanca pêdiviyên xwendekar û mamosteyan di salên ewilî yê xweseriyê de hate pêşxistin. Di çarçoveya vê modelê de ji bilî dersên li derveyî fêrbûna zimanê spanyolî û zimanên biyanî, li dibistanan dersên mayî (matematîk, zanîstên pozîtîf û zanîstên civakî) bi zimanê katalanî tî fêrkirin.

Ligel mamosteyên dibistana seretayî, mamosteyên ku li pêş-dibistan, dibistanên navîn û li zanîngehan dixebitin jî divê zimanê katalanî bizanibin. Besatiya di zimanê katalanî de divê bi sertîfîkayên fermî bî nîşandayin. Mamosteyên li pêş-dibistanan dixebitin divê dîplomoya ku piştî xwendina sê salan a zanîngehê tê dayîn, bi dest bixin.

Bi armanca fêrkirina katalanî ya di dibistanên navîn de divê mamoste zanîngehekê bixwînin. Mixabin dîplomeya ku piştî vê xwendinê de tê wergirtin jî têrî mamosteyan nake ku ew di dibistanên navîn de dest bi xebatê bikin. Ji bo hîndekariya taybet a di pedagojî an di dîdaktîkê de, divê xwendekar salekê beşdarî qursa Sertîfîkaya Pedagojîyê (CAP) bibin. Herwiha mamosteyên din ên ku dersa xwe bi zimanê katalanî didin divê besatiya xwe ya nivîskî û ya devkî ya katalanî îspat bikin. Rêvebiriya perwerdeya li welat ji bo mamosteyên ku niha di dibistanên navîn de dixebitin hîndekariyê li dar dixê. Mamoste dikarin ji bo pêşxistina zimanê xwe beşdarî qursên Enstîtuyên Perwerdeya Zanistî (ICE) bibin.

Pergala desteka ziman a perwerdeya bilind ji du aliyan pêk tê. Yek ji wan hîndekariya xwendekaran a destpêkê û ya din jî hîndekariya mamosteyan e. Di çarçoveya hîndekariya mamosteyan a destpêkê de ku bi tevahî bi katalanî tê dayîn divê mamoste beşdarî dersên teorîk û yên pratîk bibin. Di vê pêvajoyê de çavdêriya fêrgehê û pîlankirina dersan bi giranî cî digîre. Xwendekarên ku ji vê bernameya zanîngehê mezûn dibin dikarin di dibistanên navîn de mamostetiyê bikin.

Hîndekariya mamosteyan ji aliyê SEDEC (Serwîsa Fêrkirina Katalanî) û Komelaya Rosa Sensat û hin kolejên taybet ve tê meşandin. SEDEC girêdayî Departmana Perwerdehiyê ya Katalonyayê ye bi zimanê katalanî hîndekariya fermî dimeşîne. Sazî di heman demê de xwediyê tîmeke pisporên perwerdeyê ye û peywira van pisporan avakirina derfetên pedagojîyê û bersivandina pêdiviyên fêrkirinê ye. Ji bilî van navendan, saziya Omnium Cultural û GAEC jî (Koma Tevgera Dibistanê ya Katalonyayê) ligel xebatên xwe yên desteka ji bo katalanî ya li welat, ji bo hîndekariya mamosteyan bi zimanê katalanî qursan li dar dixin.

Herçiqas zimanê normal ê perwerdeya li Katalonyayê katalanî be jî divê xwendekarên ji pergala perwerdeyê mezûn dibin bikaribin spanyolî jî qasî katalanî bi kar bînin. Ji ber vê yekê namzetên mamostetiyê ligel zimanê xweser ê Katalonyayê fêrî zimanê spanyolî jî dibin.

Nejat Ayaz



Perwerdehiya Duzimanî ya Navkulturî li Perûyê: Gihandina Mamosteyên Xwecihi

Perû, wek welatên din ên Emrîkaya Latîn welatek e ku gellek zimanên xwecihi lê tên axaftin. Piştî ji aliyê Spaniyan ve hat dagîrkin gelên ku salên dûvdirêj pê de wek mêtîngêh jîyan, digel vê yekê karîne zimanên xwe û kulturên xwe biparêzin. Îro li welêt zimanê herî zêde tê axaftin digel ku Spanî ye, hê jî zêdeyî 42 zimanan bi awayekî aktîf tî axaftin. Lêbelê statuya bilind a zimanê Spanî û desthilata wî, ji dagîrkinê û vir ve bi berdewamî gefan li zimanên din ên welêt dixwe. Bi ser de piştî salên 1950î digel ku zimanên ji bilî Spanî jî di perwerdehiyê de hatine bikaranîn, ev gefxwarin bi awayekî giring tûşî tu dabirranê nebûye; lewra perwerdehiya navborî homojenbûna kulturî û bi vê yekê jî bişaftin ji xwe re kiriye armanc û di vê de jî hinek pêşveçûn bi dest xistine. Lê belê ji salên 1970î û pê de bi taybetî piştî bernameyên Perwerdehiya Duzimanî ya Navkulturî hatin pêşxistin û nîqaşa têgeha navkulturiyê dest pê kir, paradîgmaya berê guherî û sepandinên nû hatin holê. Bi encama vê re pêşveçûnên giring li qelem hatin xistin. Yek ji giringtirîn guhartinên di vê prosesê de hatî kirin jî pêşveçûnên di warê gihandina mamosteyan de ne.

Li jêr bi kurtasî li wê bernameya mamoste-gihandinê tê nihêrin ku ji bo bi zimanê Quechua perwerdehiyê bidin ku li welêt piştî Spanî zimanê duyem ê herî zêde tê axaftin e.

Gihandina mamosteyan bi salan li bilindderketina statîstîkên akademîk ên di wê perwerdehiya duzimanî de hûr bûye ku li perwerdehiya xwendekarên zimanê wan ê zikmakî Quechua ye, hatiye bikaranîn. Lêbelê bi giştî rêjeya encaman kêmtir derketiye, çî mamosteyan çî jî malbatan ji sîdewariya perwerdehiya duzimanî bi guman bûne. Lê di van salên dawî de gellek bernameyên gihandina mamosteyan êdî li naveroka mêtîngêr a pergala perwerdehiyê nihêriye û têgeha “navkulturiyê” dupat kiriye. Ji ber vî yekî di bernameyan de ji aliyê rêbaz, naverokên perwerdehiyê û çalakiyên hatî sepandin ve guherînên giring hatine kirin.

Armanca van bernameyên mamoste-gihandinê ew e ku mamosteyan li herêmên gundewarî û li deverên ku du ziman tî bikaranîn, li gorî rêbazên perwerdehiya duzimanî û navkulturiyê amadeyî xebatê bikin. Her çend armanca bîngêhî a ber-

nameyan gihandina mamosteyan be jî car caran cih tê terxankirin bo amadekirina materyalên dersan jî. Gava berendam tîh hilbijartin ji bo bernameyê girîngiyeke taybet tê dayîn bo berdewamiyê, ji ber vê yekê jî pîvanên cûrbicûr hatine pêşxistin. Yek ji van jî ew e ku mamoste di nav “torên dibistanan” de bixebitin. Li gor vê yekê dibistanên wek erdnîgarî nêzîkî hev bin “tor”ekê pêk tînin û mamosteyên li vê herêmê dimînin, ji bo herêma xwe siyaseteke hevpar a perwerdehiyê destnîşan dikin. Di nav van de mijarên mîna semînarên hevpar ên mamosteyan û peydakirina fonan ji bo cûreyên çalakiyê û projeyên pêşveçûnê jî cih digrin. Tor tev bi vî awayî dixebitin û her sal raporeke xebatên ku kirine pêşkêşî wezareta perwerdehiyê dikin.

Mamosteyên ku di sê pileyên wek pêş-dibistan, dibistana seretayî û hîndekariya duyem hatî diyarkirin de dixebitin, beşdarî vê bernameyê dibin.

Taybetmendiyên mamosteyan

Hem mamosteyên pêş-dibistanê ku ji gelê xwecih in û perwerdehiyeke taybet a zanîngêhê wernegirtine, hem jî mamosteyên pileyên din ku perwerdehiya mamostetiyê wergirtine, beşdarî bernameyê dibin. Lê belê tu yek ji van jî bi awayekî fermî perwerdehiyeke wek perwerdehiya duzimanî wernegirtiye. Ji aliyekî din ve hemû hem di zimanê *Quechua* de hem jî di zimanê *Spanî* de bi tîra xwe ghiştî ne. Bi ser de pîrriya wan salên xwe yê zarokatiyê li van herêmên gundewarî derbas kirine. Lê di navbera mamosteyên ku perwerdehiya fermî wergirti û kesên ji gelê xwecihî û perwerdehiya fermî ya mamostetiyê wernegirti de di warê hesasiyeta zimanî û kulturî de cudahiyan balkêş hene. Mamosteyên gundan ên ji gelê xwecihî ku beşdarî lê kirine, bêhtir xwe li bernameya navkulturîtiyê guncandine. Wek nimûne; jinên li pêş-dibistanên gundan dixebitin, çavdêrî li wê yekê kirine ku hindek pêşniyarên ji aliyê sazîyên fermî ve hatî amadekirin qet li konteksta xwecihî nayên û xwendekaran aciz dikin û li şûna vê dest bi bikaranîna rêbazên ku wan xwe bi xwe pêşvebirî, kirine.

Zimanên di perwerdehiyê de tîh bikaranîn

Modêla perwerdehiya duzimanî ya li herêmê tê sepandin, li gorî pêşniyarên mamosteyên di nav torên dibistanan de ji aliyê wezareta perwerdehiyê ve tê amadekirin. *Quechua* ku zimanê bîngêhîn î herêmê ye, şeş salên pêşî pê de bûye zimanê bîngêhîn ê ku hemû karûbarên perwerdehî û hîndekariyê pê tîh kirin. Lê belê di van şeş salan de saetên *Spanî* ku wek dîrsa zimên tê dayîn, pile bi pile zêde dibin. Bername her çend pêşniyar dike ku di pileya duyem de jî zimanê *Quechua* bibe zimanê perwerdehiyê, qanîkirina mamosteyan li ser vê mijarê her tim mumkin nabe. Lewma di pratîkê de hindek ji mamosteyan bi zimanê *Spanî* perwerdehiyê didin.



Di bernameyê de hatiye diyarkirin ku wê çawa hîndekariya Spanî wek dursa zimên bê dayîn. Li gorî vê Spanî, wê bi rêbaza ragihandina çalak (communicative approach) bê dayîn. Di dersan de bêhtir li ser hînbûna axaftinê tê rawestan. Ji bo vê bi hûrdekarî hîndariyên axaftinê hatine destnîşankirin. Herwiha nêzîktêdayîneke “li ser bingehê maf” jî tê pejirandin. Lewra Spanî zimanê mêtîngeran e û gava li nav civatê tê axaftin bi giştî têkiliyeke desthilatê ya dûr ji wekhevîyê jî derdixe holê. Lewma bernameyê serwextkirina xwendekaran derbarê bikaranîna Spanî de û têkiliya wê ya ligel cîyawazîperestiyê jî ji xwe re kiriye armanc.

Mijarên tên Nîqaşkirin

Digel ku hema bêje tevahiya mamosteyan di asteke baş de dikarin bi zimanê Quechua biaxivin jî, ji ber ku perwerdehiya xwe ya mamostetiyê bi Spanî wergirtine, di mijarên wek rêzikên xwendin-nivîsandinê, hevoksazî û rastnivîsinê de bi zimanê Quechua dibe ku bi têra xwe ne xwedî zanînekê bin. Lewma gava hewl didin xwendin û nivîsandinê bidin ber zarokan dikevin taya ku xeletiyên bikin. Her wiha ji ber ku aloziyek derbarê zimanê nivîsandinê de heye jî mamoste dikevin tengasiyê. Lewra hindek alî bikaranîna zimanekî standard ê Quechua li hemû herêman, rast dibînin lê ji aliyekî din ve jî hindek alî wê yekê diparêzin ku divê cudahiyan zaraveyan yên li deverên cuda li ber çavan bê girtin û zimanekî xwendin û nivîsandinê yê “pîrr-zaraveyî” bê tercîhkirin. Her çend bername bêhtir li aliyê standardbûnê be jî beşeke mezin ji mamosteyan piştgiriya aliyê ku derbarê zaraveyan de hessas e, dike. Lê belê nîqaşeke bi vî rengî ji aliyekî ve jî bi kêrî wê yekê hatiye ku mamoste derbarê zimanê Quechua de bîrbirin û lêhaybûna xwe bi pêşvetir bibin. Nîqaşeke din a girîng jî di warê wergerandina deqên (tekstên) akademîk ji zimanê Spanî bo zimanê Quechua û nivîsandina deqên akademîk bi zimanê Quechua de ye. Wezareta perwerdehiyê, ji bo hemû polan kitêbên dersê yên Spanî amade dike û dişîne herêman. Digel ku ev kitêb li zimanên xwecihî tên wergerandin jî mamoste gellek çaran gazinan ji wê yekê dikin ku peyvên çêkirî yên ne ji wan bi xwe re ne jî ji gel re çavnas in zêde tên bikaranîn û hevokên li hevoksaziya zimanên xwecihî nayên tên bikaranîn.

Her wiha xwedî îtibarkirina zanyariya akademîk li hemberî cûreyên din ên zanyariyê jî yek ji mijarên nîqaşê ye. Lewra “zanyariya akademîk” ku bêhtir berhemeke zanîna rojavayê ya xwedî îtîbar e, gellek çaran wek zanyariya “gerdûnî” û “herî rast” tê bicîhkirin, û zanyariya nerojavayî jî wek “keleporî” û “xwecihî” li zeman û mekan tê hepskirin. Di vê rewşê de zanyariya “nîqaşî” û “notr” û “zanistiya xwerû” û “gerdûnî”, piştguh dike ku hemû cûreyên zanyariyê û awayên zanînê ji aliyê hinekan ve di dîrokê de di wext û warekî diyar de hatine hilberandin. Li beramberî vê her cûre zanyariya nerojavayî jî bi têgehên mîna “etno-akademîk” û “etno-biyoloji” û “etno-tib” û “etno-astronomî” bi nav dike. Ev jî di rastiyê de dihêle ku têkiliyên

nû-mêtinger bèn hilberandin û berbelav bibin. Ji ber vê yekê ji bo dabirrana zanariyê ji mêtîngehkirina wê bê pêkanîn, mamosteyan ve di bernameya mamostegihandinê de rêyeke sê pileyî daye ber xwe. Ev pile bi kurtayî wiha ne:

-Giring e mirov lê hay bibe ku zanyarî bi nîrxên cûrbicûr dorpeçkirî ye û xwedî reng û zayend û reh e û lewma jî awayekî fikirînê ye.

-Keşfkirin û jinûve nîrxandin û jinûve sepandina zanyariyên keleporî û di heman demê de lêpîrsîna awayên zemangerayî û mekangerayiyê ku li van zanyariyan hatî barkirin û ew ne wek “zanyarî”yê lê wek “zanyariya keleporî” kod kirine.

-Şêweyên zanyariyên cûrbicûr, wek komikan ya jî wek yekeyên bi teqezî hatî diyarkirin û ser û binê wan girtî (asê), bi besîti bi hev neyên têkildarkirin; bereks, divê wek fêdeyên li hilberînên nû yên rewşenbîrî li qelem bèn xistin.

Li gorî zanîna xwecihî hîndekarî

Yek ji armancên vê bernameyê jî ew e ku zanyariya xwecihî ya Andê (û zanariyêgehêzên wê) di bernameya hîndekariyê ya dibistanê de bê bicihkirin û bi zanariya Rojavayê ya “hatî gerdûnîkirin” re û bi rewşenbîrîyên (rhetoric) serdest ên Peruyê re were heman radeyê. Wek prensîb pêkanîna vê mumkin e, lewra dariştina naveroka bernameya hîndekariyê serbest hatiye hiştin. Mamoste, dibistan û herêm bi awayê ku li şert û mercên xwe yên xwecihî bigunce, dikarin bernameya hîndekariyê hem ji aliyê naverokê hem jî ji aliyê rêbazê ve biguherin. Lê belê wisa xuya dike ku karê bîngêhîn di sepandinê de li ser mamosteyan maye. Lewra pîr-raniya mamosteyan berê zanyariya xwecihî ya Quechua biçûk ditiye û xwe wek endamekî vê zanyariyê û vê civakê neditiye. Lewma ev mamoste divê daraziyên xwe yên berê yên derbarê zanîna Quechua de bişkinin, li ser mijarên wek hîndariyên fikirîna analîtîk perwerdehiyê wergirin û her wiha fêrî sepandina stratejiyên nû bibin. Wek nimûne; di navbera salên 2003 û 2006an de di semînarên mamostegihandinê de tîmayên bi vî rengî hatine nîqaşkirin: Çima divê em zanîna Andê bizanin?, Ji bo gelên xwecihî “kalîteya jiyanê” tê çi wateyê?, Zanîna Andê parçeyek e ji awayên fikirîna xwendekarên me, Mamoste jî ‘xwendekarên’ zanîna Andê ne, Têgehên xwecih dibe çawa ji nû ve bèn sazîkirin?, Fikirîna matematîkî di zanîna Andê de, Fêrkirina pratîkên xwendin û nivîsandinê bi awayekî ku li kulturê bigunce, Cûrbicûriya bernameya hîndekariyê û dariştina sala dibistanê û dersan li gorî salnameya gel.

Her wiha ligel mamosteyan projeyên cûrbicûr hatine meşandin û çalakiyên ku li salnameya gel biguncin –wek nimûne, derbarê çandiniyê de- hatine kirin û xwendekar û mirovên ji gel beşdarî van projeyan bûne. Bi saya projeyên bi vî



awayî, perspektîfa mamosteyan di dibistanan de di warê zanîna xwecihî û awayên zanyariyê de hatiye berfirehkirin û di bidestxistina kûrahiyê de hewl hatiye dayîn. Lê belê bi vê jî nemaye; ji naveroka bigrin heta bi bernameya hîndekariyê, ji rastîbûna rêbazên hîndekariyê yên tîn bikaranîn heta bi rewşa materyalan, di bîrûboçûn û helwestên li ser gellek mijarên wek keleşporên dibistanê, bikaranîna zimên, heta bi cilûbergên di dibistanê de veguherînên giring hatine jiyîn.

Jinûve pênamekirina tîkiliya di navbera dibistan û civakê de

Mamosteyên beşdarî bernameyê dibin, serê pêşî bi giştî xwe bi pîşeyên xwe re, dibistanên xwe re û bernameya hîndekariyê ya neteweyî re yekbend dikin û li ser mijarên wek “pêşveçûn”, “kalîteya jiyane” û “pêşketin”ê dibe xwedî fikrên sabit bibin. Bi awayekî din ger bê gotin, pîrrianiya wan xwe wek endamê komeke etnîk û civata tê de dixebitin pêname nakin û xwe bi vî awayî nadin naskirin. Di vê barê de çend armancên bingehîn ên bernameyê hene:

-Jinûve sazkirina nasnameya wan mamosteyan ku jiyana xwe pê de tûşî cîyawazîperestiyên giring bûne û ji ber nebûna fikrekî alternatîf li ber feraseta “jiyana baş” a Rojavayî ku ji civaka xwe xerîb bûne û ji kultura Quechuyê dûr ketine; Bi kirina dibistanê ya ji parçeyekî civakê û bi jinûve diyarkirina cihê dibistanê yê di nav civakê de, jinûve avakirina tîkiliya di navbera dibistan û civakê de;

-Pêkanîna tevlibûna mamosteyan nav tîkiliyên rojane yên gel bi awayekî çalak û hewldana zemînxweşkirinê ji bo gel modêla dibistana ku ew bi xwe dixwazin biafirînin;

-Peydakirina wan rîyan ku gel bikare di şertûmercên wekhev de tevli warên din ên gelemperî jî bibe.

Ji bo biserxistina vê yekê, tîmayên wek rola perwerdehiyê di nava civakê de, dîroka perwerdehiya bi zimanê mêtînger li gundên xwecihî, bîrbirî û helwestên mamosteyan derbarê civakê û xwendekaran de, cîyawazîperestiya kulturî û zimanî di dibistanan de û cîyawazîperestiya di polan de, di çarçoveya bernameyê de li serê hatiye axaftin û projeyên pîlot hatine sepandin ku tê de mamoste û gel li hev civiyane. Bi saya vê, hem mamosteyan hem jî gel dev ji wê bawerîya ku ji bo “pêşveçûnê” tekane rê hîndekariya bilind e, berdaye û li şûna vê dest bi balkişandina ser giringiya wê yekê kirine ku dînamîkên xwe yên xwecihî baştir fêhm bikin. Ji bilî van, bernameyên radyo û televizyonan hatine lidarxistin ku mamoste û gel hatine ba hev û kirine, wekî din jî dest bi lidarxistina konferansên salane hatiye kirin ku tê de mijarên cuda yên perwerdehiyê tîn nîqaşkirin. Ji bo berde-wamîbûna van xebatan bê pêkanîna jî heta ji dest hatiye gellek alî bi awayekî çalak

tevlî pêvajoyê hatine kirin. Navê konferansê bûye “Lihevciwandina Du Zanyariyan: Derfetên Perwerdehiya Duzimanî ya Navkultûrî û Kêşe” û ev ne li paytextê herêmedê lê li bajarekî hê deverî hatiye lidarxistin, bi vê jî bal hatiye kişandin ser wê yekê ku vesazkirineke xweser çî qasî giring e. Her wiha ji bo piştgiriya li zimanê Quechua pûte bi wê yekê hatiye dayîn ku pêşkêşî bêhtir bi zimanê Quechua bin.

Dibetiyên Rêveberiya Xweser

Ger bi awayekî siyasî û rêveberayetî nehata tevgerîn, hema hema yek ji wan pêşveçûnên li jorê hatî behskirin dibû ku pêk nehata. Perwerdehî, li seranserê welêt di derbasbûna rêveberiya xweser de bûye xwedî roleke giring û hiştiye gel bi awayekî çalak beşdariyê lê bike û hiştiye siyasîyê Perwerdehiya Duzimanî ya Navkultûrî li hemû herêman bê sepanandin. Her wiha bi saya torên hatî avakirin, temsîlkarên perwerdehiyê û temsîlkarên dam û dezgehên civaka medenî yên ji herêmên cuda hatî, projeyên xwe yên salane yên perwerdehiyê li gorî herêmên xwe bi pêş ve birine û derfeta berawirdkirina bi herêmên din re bi dest xistine.

Ger bi kurtasî behsa hemû nîqaşên li jor bê kirin; têgeha navkultûrîyê di perwerdehiyê de bi tenê ne rêbazek e; di heman demê de li gellek herêmên paş-mêtingeh ji bo ji nû ve rê li ber nîqaşkirina şertûmercên mêtingehê yên li dû mayî bê vekirin jî potansiyeleke giring di nava xwe de dihewîne. Li Perûyê jî mîna li salên 1950î tê dîtîn perwerdehiya duzimanî, bi tena serê xwe dawilêhatina mêtingeriyê gerentî nekiriye û di vê rewşê de rê li ber veguherandina pergala siyasî, aborî û civakî ya serdest venekiriye. Lêbelê ji salên 1970yî pê de bi derketina têgeha navkultûrîyê ku ji aliyê gelên xwecih ve hatî pêşvebirin, dest bi lêpîrsîna li bernameyên hîndekariyê yên veşarî hatiye kirin û hatiye derxistin ku rêbazên perwerdehiyê û materyalên dersê yên tîkî bikaranîn çawa tîkîyên desthilata mêtinger bi berde-wamî ji nû ve hilberandiye. Piştî pêşveçûnên bi vî rengî jî li erdnîgariya Emrîkaya Latîn tevî daxwazên navkultûrîyê berbelav bûne.

Susanne Jacobsen Perez

Têbînî: Ev nivîs, ji gotara bi navê “The Contribution of Post-Colonial Theory to Intercultural Bilingual Education in Peru: An Indigenous Teacher Training Programme” bi kurtkirin hatiye wergirtin. Ji ber vê hevokên di nivîsê de hati bikaranîn ne wergerên rasterast ên deqa orijînal in. Gotar, di kitêba bi navê Social Justice Through Multilingual Education de hatiye çapkirin ku bi editoriya Tove Skutnabb-Kangas, Robert Philipson, Ajit K. Mohanty û Minati Panda hatî weşandin.

1 And, navê meztirîn rêzeçiyayên cihanê ye ku di gellek welatên Emrîkaya Latîn re derbas dibin û navê wê herêmedê bi xwe ye. Qeđimtirîn şaristanîyên cihanê yên wek Maya, Aztek û Înkayan ev rêzeçiya û derdora wê ji xwe re kiribûne wargeh. Îro ji beşeke mezin ji gelên xwecih ên li Emrîkaya Latîn li derdora van rêzeçiyayan dijîn.

KURD
KURDI
KURDISTAN





